Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1281 15-Pûşper-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# 52 sal ji nivîsîna domdar Ebas Ebas 16 berhem afrandine

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Ebas Ebas nivîskarekî Kurd e ku muhra xwe li wêje û mîrateya nivîsa pexşanî ya gelê Kurd xistiye. Ev 52 sal in ku di warê roman, kurteçîrok û nivîsên şanoyî de xebata nivîsînê didomîne û bi temenê xwe yê 79 salan dikarîbû 16 berheman biafrîne.**




Qada nivîsînê ji qadên herî girîng û estetîk di wêjeyê de ye, nivîskar pênûsa xeyal, derbirînên xwe ye ku hemû hest û hizrên xwe vediguhêze rûpelên pirtûkan. Yek ji van nivîskaran li Rojavayê Kurdistanê jî nivîskar Ebas Ebas e.

**Çavê xwe li gundê Nisran vekir**

Dema ku warê Nisran kavil bû û jiyan şahidê destpêka avakirina wî gundî bû ji sala 1946'an nivîskar Ebas Ebas dibe mêvanê jiyanê û li gundê Nisran ji dayîk dibe. Ew ji malbata begê gund e û malbata wan naskirî ye li herêma Tirbespiyê. Ebas xwendina xwe ya sertayî sê salan li dibistana Hatim Eltaî dixwîne, lê paşê vedigere gundê xwe û bi zarokên gund re qonaxa seretayî bi dawî dike. Piştre dîsa vedigere Qamişlo û li dibistana Elnehde ya taybet ya suryaniya heya refê 12'an dixwîne û bawernameya wêjeyî werdigire. Di wê demê de wî ji xwendinê hes nedikir, sedemek jê ew bû ku perwerde ne bi zimanê wî bû, hem jî rêjîm zimanê Kurdî qedexe dikir, hem jî ji hêla suriyaniyan ve ew û hemû zarokên Kurdan rastî pirsgirêkên nijadperestiyê dihatin. Piştî serkeftina di qonaxa amadeyî de, ew berê xwe dide Şamê û li zanîngeha paytextê beşa felsefê dixwîne, di sala siyem a xwendina xwe de ji ber ramanên felsefî ji hêla hikumetê ve tê girtin, piştî sê salan ji xwendina zanîngehê, dest ji zanîngehê berdide. Di encamê de dema ku carekê ji Beyrûtê vedigire, ji hêla rêjîmê ve ji ber xizmeta leşkerî tê girtin, sê sal û nîvan xizmetê dik,e bi keça apê xwe re di sala 1976'an de dizewice û dibe xwedî zarok, mal û mewdan. Ebas ji karê çandiniyê hes dikir, lewma jî demeke dirêj bi karê çandiniyê ve mijûl dibe, heya roja îro jî wiha ye.

**Li gel karê leşkeriyê rahişte pênûsê**

Nivîskar Ebas dema ku leşker bû li gel parêzvaniya Sûriyê, di sala 1973'an de dest bi geştiyariya nivîsandinê dike û dibe rêhevlê pênûs û lênûsê. Ji ber qeyd û bendên li ser zimanê Kurdî ew bi pênûsa erebî dest bi nivîsandina şano û kurteçîrokan dike, lê hestên netewperweriya Kurdî di nav zeviyên hevokên wî de dide diyarkirin. Di destekî de çekê wî hebû yê ku neçar bû bibe hilgirê wê û di destê din de bi dilxweşî ramanên Kurdwariyê li ser rûpelan dinivîsand. Lewma jî şanoya xwe ya bi navê Bêjing bi zimanê erebî dinivîsîne paşê dema ku diçe Elmaniyayê werdigerîne zimanê Kurdî û çap dike. Lê di ber karê leşkeriyê de ya ku sê sal û nîvan didomîne, nivîskar Ebas kurteçîrok nivîsandine. Di wê demê de bandora sosiyalîstbûnê û êşa civaka Kurdî lê dibe û dixe mijara nivîsê. Dema ku leşker e dizewice, dibe şahidê Cenga Tişrînê jî û piştî sê sal û nîvan vedigere gundê xwe nêzî 10 salan karê çandiniyê dike û diçe Elmaniyayê.

**Gemiya çarenivîsê berê jiyana Ebas dide xurbetê**

Di sala 1987'an de şert û mercên jiyanê dihêlin ku ew ji welat koçber bibe û here xurbetê da ku li Elmaniyayê bi cih bibe. Dema ku dighêje wir fêrî zimanê Elmanî dibe û teksiyeke taybet ji bo xwe dikire û weke ajokarekî li ser kar dike. Di nava qerebalixa jiyana xurbetê de, erebe û xelkên ku ne bi zimanê wî diaxivin, bayê romanê li hest û dilê wî dixe, êdî li nik karê xwe dest bi nivîsîna romanê dike. Herwiha ji ber ku Ebas berpirsê Kovara Rewşen bû, kesayetekî din bi tenê tê de bi Kurdî li ser navê teva dinivîsand, ji ber vê jî qelsbûnek di nivîsê de hebû, wê demê jî Apê Osman Sebrî û Rêber Apo nivîsê dixwînin û vê yekê rexne dikin, ji ber vê rexneyê jî Ebas xwe fêrî zimanê Kurdî dike. Ew karê xwe yê nivîsê û çapkirina berheman, hem jî xebata li ser erebeyê didomîne. Di wê dema ku li Almaniyayê dijya, sala 2005'ê de ew tê Bakurê Kurdistanê, li gel xwe jî 7 hezar pirtûkên xwe û yên gelek nivîskarên Kurd tîne pirtûkxaneyên Kurdî. Herwiha nivîskar Ebas piştî çapkirina 16 berhemên xwe, di sala 2022'an de vedigere welêt û li gundê ku çavê xwe lê vekiribû, jiyana xwe bi temenê mezin didomîne.

**Xwediyê artêşek ji roman, kurteçîrok, nivîsên şanoyî û gotarên cihêreng**

Ebas jî weke gelek nivîskarên din ên Kurd êşa miletê xwe di hiş û jêdera derbirîna xwe de meyandibû. Piştî ku derfet jê re çêdibe êdî bi hevokên zelal û dagirtî çîroka netewa xwe, hizr, êş û şêwazê jiyana gelê Kurd li ser rûpelan diteyîsîne. Lewma jî wî 5 nivîsên şanoyî pêşkêşî hunera şanoya Kurdî kirine, berhemek jê ya bi navê Şevên Zivistanî û Melekê Tawus di sala 1996'an de li Elmaniyayê çap dike. Di heman demê de jî Ebas bi navê Gornebaş şanoyek li Almaniyayê di sala 2020'an de çap dike. Ebas şanoyeke din bi navê Bêjin di sala 2021'ê de li Elmaniyayê çap dike, hem jî di heman salê û heman cihî şanoya Penaber dide çapkirin, paşê jî di sala 2022'yan de şanoya Kurm li Elmaniyayê çap dike. Şano têra derbirîna Ebas nekir, lewma berê xwe dide nivîsandina kurteçîrokan, 2 berheman çap dike. Ebas pirtûkekê bi navê Ez û Şalûl, di 2005'an de li Elmaniyayê dide çapkirin, hem jî berhemeke din a kurteçîrokan bi navê Ax War li Almaniyayê di sala 2020'an de çap dike, li aliyekî din bi navê We Kuntû Ene Elbakî pirtûkeke kurteçîrokan bi zimanê erebî li Elmaniyayê di sala 2020'an de çap dike. Kurteçîrok jî nabin bersiv ji hest û derbirînên nivîskar Ebas re, lewma berê xwe dide celebê romanê û 6 romanan dinivîsîne. Ebas romana xwe ya bi navê Şivanê Berxan û romana Xewnên Şiyarî di sala 2004'an de li Stenbolê derdixe. Herwiha romana Helbestvan di sala 2005'an de li Stenbolê derdixe, dîsa jî li heman sal û cihî romana xwe ya bi serenavê Dengbêjê Piçûk derdixe û romana Neviya Çîyayekî di sala 2006'an li Stenbolê çap dike. Piştre jî nivîskar Ebas, romana xwe ya bi navê Piştî Çi di 2024'an de li Rojavayê Kurdistanê çap dike. Ji bilî van berheman, 2 pirtûk bi zimanê erebî hene,( ew tev bîranîn û gotarên cihêreng ên wî hene, di heman demê de hîna pênûsa wî di xizmeta ziman û wêjeya kurdî de ye û li ser nivîsandina romaneke din bi temenê xwe yê 79 salan, xebatê dike.




## FERHENGA BIWÊJAN

**Kir pêlav û kir piyê xwe/kir pêlav û kir piyan:**
- Bêrûmet kir; qîmet jê re nehişt; piçûk kir.

**Ma hesp ez revandime:**
- Ez wisa ne gêj im; min bêaqil nebîne.

**Ma ew jî tiştek e:**
- Tişta tu dibêjî ne pir balkêş e; tiştên balkêştir hene.

**Ma ew jî gotin e?**
- Bi heman wateyê.

**Nalbendan hesp nal dikirin kîso jî pepilê xwe bilind dikir:**
- Dema yek xwe ser xwe re nîşan dide, yan ne li gorî rewşa xwe diaxive hingê tê gotin.

**Ne gayê wê cilê ye:**
- Ne ew mêr e; ew mêranî pê re nîne; çawa ku dibêje ne wisa ye; newêrek e.

**Piçûk xist/piçûk kir:**
- Bêqîmet kir; qîmetê wî şkand.

**Rihê diqusîne neynikê li ber digire:**
- Henekên xwe pê dike; hem zererê didiyê, hem kenê xwe pê dike; hem zererê didiyê hem çawa ku jê hes bike wisa xwe nîşan dide.

**Rûviyê newalan bû xwediyê malan:**
- Kesê bi kêrî tiştekî nedihat, îro mezin bûye.

**Serê xwe nexe serê min:**
- Tu ne hemberê min î; tu ne li qama min î.

**Serê xwe nexe serê hûtan:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî


### Sudoku: Bersiv 43

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 3 | 4 | 9 | 6 | 7 | 2 | 8 | 1 |
| 6 | 2 | 7 | 8 | 5 | 1 | 9 | 3 | 4 |
| 1 | 9 | 8 | 2 | 4 | 3 | 7 | 6 | 5 |
| 4 | 6 | 2 | 7 | 3 | 9 | 1 | 5 | 8 |
| 9 | 7 | 1 | 4 | 8 | 5 | 3 | 2 | 6 |
| 8 | 5 | 3 | 1 | 2 | 6 | 4 | 7 | 9 |
| 7 | 4 | 6 | 3 | 1 | 8 | 5 | 9 | 2 |
| 2 | 8 | 9 | 5 | 7 | 4 | 6 | 1 | 3 |
| 3 | 1 | 5 | 6 | 9 | 2 | 8 | 4 | 7 |

### Sudoku:Pirs 44


| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 9 | | | 2 | 1 | | |
| | | 6 | | | | | | 3 |
| 3 | | 7 | | 4 | | | | 9 |
| 4 | | | 7 | 3 | | | | 5 |
| | 5 | 3 | | | | 7 | 1 | |
| 7 | | | | 1 | 4 | | | 2 |
| 9 | | | | 6 | | 5 | | 1 |
| 8 | | | | | | 2 | | |
| | | 5 | 2 | | | 6 | | |

## Li dora jinê hûnandina jiyanê



Her çendî ji jina xwedawend rastî û heqîqeta wê hatibe dizîn jî, lê dîroka jin a ku xwe dispêre bi hezarên salan ku civakbûyîn û jiyan li derdor wê hatiye hûnandin û avakirin, heye. Ew serdem jî Serdema Şoreşa Neolîtîk e.**R-2**

## Zekî Bedran: Nasnameya hebûna PKK'ê Rêber Apo ye



Siyasetmedarê Kurd Zekî Bedran anî li ser ziman ku PKK û Tevgera Azadiyê bi têkoşîna xwe ya 52 salan gelek destkeftî ji bo gelê Kurd dan qezenckirin û wiha got: "Rêber Apo bi avakirina PKK'ê gelê Kurd ji pencê qirkirinê xelas kir."**R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1281 15-Pûşper-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S



## Tevlîbûna çekdarên biyanî di nava artêşa Sûriyê de

Di meha derbasbûyî de Nûnerê serokê Emerîkayê Thomas Barrack ragihand ku ew tevlîbûna bi hezarên çekdarên biyanî yên tundiraw di nava artêşa Sûriyê ya nû de erê dikin. Ev gav jî li cem gelên Sûriyê bû cihê metirsiyê.**R-5**




## 'Xebatên Zarhunera Havînê mîna dibistaneke hunerî ye'

Endamê Şanoya Çiya ku yek ji rêveberê projeya Zarhunera Havînê ye Simko Cûdî diyar kir ku xebatên projeya Zarhunera Havînê ji bo vejandina çand û parastina nasnameya her zarokekî/ê ye, hem jî qezenckirina demê bi awayekî rast ji bo zarokan e.**R-7**



**Xemsariyek diplomasiya me Kurdan!**
Ahmet Aktaş R-4



**Di dema qirkirinê de strîna strana azadiyê**
Remezan Olçen R-7

# XWEPARASTIN HÎMÊ JIYANA AZAD E

Di pêvajoya ku niha giştî cîhan û bi taybet Rojhilata Navîn tê de derbas dibe, rêxistinkirin û xweparastin misogeriya hebûn û azadiya gelan e. Ji bo gelê Kurd jî xweparastin tişta herî girîng e, bêparastin jî mîna xwetunekirinê ye. Berdevka Meclisa Jin a PYD'ê Netewî Xemgîn diyar kir ku xweparastin hebûna mirovan nîşan dide û wiha got: "Ji bo berdewamiya jiyanê xweparastin girîng e, herwiha mirov bi rêya fikir û xwerêxistinkirinê jî dikare parastina xwe bike."**R-6**













## Ji dema Serxwebûnê ve sîstemên desthilatdariyê li Sûriyê... û sîstema herî guncaw ji bo Sûriya îro... (1)

Sûriyê di sala 1946'an de serxwebûna xwe bi dest xist. Sûriyê civakeke piralî bû ku ji parçebûnên neteweyî, olî, mezhebî, eşîretî û bajarî ve rastî astengîyan dihat. Herwiha di navbera niştecihên bajar û yên gundewaran de, koçber û niştecihên bajaran û di navbera bajarên mezin, bi taybetî Şam û Helebê de, rastî dubendîyan hat.**R-3**

# Li dora jinê hûnandina jiyanê


Her çendî ji jina xwedawend rastî û heqîqeta wê hatibe dizîn jî, lê dîroka jin a ku xwe dispêre bi hezarên salan ku civakbûyîn û jiyan li derdor wê hatiye hûnandin û avakirin, heye. Ew serdem jî Serdema Şoreşa Neolîtîk e.

**Esma Mistefa**

Li gorî teoriya `Bîng bangê` ku temenê gerdûnê tê texmînkirin 13 milyar sal e û bi demê re zindî hatine avakirin û gihştiye asta mirovbûnê, êdî jiyana zindiyên bi aqil û fikir yên mirovan tê destpêkirin. Gelo ev zindiyên bi aqil û hizir çawa karîn li hember jiyan û zehmetiyan xwe rabigire û xwe zêdebike; gelek girîng e. Di mijara lêkolînkirina gerdûn, mirovahî, xweza, şaristanî û dîroka civakbûnê û zindiyan de, ji lêkolînvanekî û profesorekî professonel di van mijaran de; Rêber Abdullah Ocalan bi giranî li ser van mijaran lêkolînkiriye û ponijiye. Emê zêde di mijarên gerdûnî de nemînin ji ber mijara ku em dixwazin balê bikşînin ser `Civakbûyna ku li derdora jinê hatiye avakirin û pêşxistin e`.

Min çima bi vê yekê re destpêkir! Piştî qonaxa avabûna gerdûn û miroahiyê, însanê ku jiyana destpêkê keşif kir da ku mirovahî xwe zîdebike, biparêze û pêşkeve; dibînin e.





### Avabûna civakê li derdor jinê (Şoreşa Neolîtîk)

Em dîrokê tenê nivîskî nagirin dest. Gelek dane hene ku di civaka xwezayî de çandeke xwedawendiyê hatiye jiyîn û li derdora jinê civakbûnek pêş ketiye. Di destgirtina dîrokê de jî armanca me ne îspatkirina hebûna civaka xwezayî ye. Ji wê bêhtir ew civak çawa hatibû avakirin û birêvebirin, rastiya mirovahiyê di wê demê de çi bû. Divê em bizanibin ku mabesta me ji van mijaran ne ku kê beriya kê tiştek keşif kiriye, yan kê çandinî pêşxistiye yan kîjan zeyendê bar rakiriye. Rastiyek heye ne ku mîtolojîke an jî metafîzîke; jiyanek li derdor jinê dihat avakirin û pêşxistin. Jinê pêşengtiya şaristandiya demokratîk a wê demê kiriye û gihandiye asta mirovahî bifire. Ger îro pergala serdest vê hebûnê ango rastiyê înkar dike divê em jinê ve giryadayî bûn. Bi mijûlbûn û ponijandina xwe a li ser hemû hurguliyên li derdor xwe her wiha bi zakayên xwe yên analîtîk û hestiyarî dikarî bi awayekî leztir berhemên xwezayê keşif bike û bike malê civakê.

Dayîka xwedawend bi hemû hêza xwe da ku mirovahiyê li ser piyan bihêle; Kar dikir ango şoreş avadikir. Çima em dibêjin şoreş, li gorî civaka xwezayî ku mirovahî şerê xweparastin û xwezêdekirinê dike, her tişt bi zanîn û xuliqandin diviya bû. Pêşketina ziman, deng, xwarin, amûrên bikaranînê di jiyanê de weke ku çawa xwarin bixwin çawa çêkin, çawa lawiran bigrin, amûrên xweparastinê, nisil zêdekirin, tedawî, tevn, destar û keşifkirina giyayan her wiha çawaniya zêdekirina van giyayan, gerdûn û rêfleksa avhawayê û bi hezaran mînakên wiha.

Ev keşifkirinên wê demê ne hêsan bûn. Ji bo zanabûna her xalekî ji van bi sedan sal dem girtiye û pêş ketiye. Pêşketina civaka neolîtîk a destpêkê bi gotina "Şoreşa Neolîtîk" tê pênasekirin. Em amûrên herî ji rêzê yên niha di destên me de, bi ked, şoreş, û hezaran salan li ber xwe daye û gihiştiye vê astê. Dîtin û afirandinên wê demê em dikarin îro weke ji nexweşiya pençeşêrê re derman dîtinê pênase bikin. Ev jiyan jî li derdora jinê dihate hunandin û afirandin. Jin ji ber van berhemên xwe, pîroz dihat dîtin. Jina dayîk bi van berheman bûye navenda avabûna civakê û xwdîderketina li wê. Di serdema neolîtîkê de ev şoreş bi serê xwe ye.

Em vê yekê weke Şoreşa Neolîtîkê dinirxînin. Weke şoreşa çandinî û cotkariyê jî tê pênasekirin. Rista jinê di vê derê de esas e. Em şoreşa ewil ya mirovahiyê, weke berhemeke jinê dikarin binirxînin. Zanist û pêşketina teknolojiya heyî jî rista xwe ji wê demê digre.

Me berê xwedawendî, weke jineke por dirêj, qralîçeyeke xeyal dikir. Lê ne wisa ye. Xwedawendî taybetmendiya jinên pêşeng ku di nava civakê de rista xwe dîlîzin e. mînak hinek peykerên çanda Til Xelef yên wê demê de hene; ji wan pêykeran tu fêm dikê ku şîr dayina zarokê xwe ya jinê pîroz tê dîtin. Lewma ji bedena xwe tiştekî diafrîne û jiyanê didomîne. Di hin peykeran de destnîşan dikin ku pesîrên jinê berhem dide û pîroz e. Divê em xwedawendiya jinê bi van nirx û pîroziyan re bigrin dest û têbighêjin. Çawa ku em dibêjin xwedawand, diafrîne, diparêze, dide jiyîn û hwd; Di vê derê de jî bi şîrê xwe jin dide jiyîn. Ew hemû nirxên ku li derdora jinê pêş dikevin, dihêlin ku civak xwe ava bike, bide jiyîn, biparêze û debara xwe bike.

Divê em ji bîr nekin ku jina xwedawend di aliyê zanistî û aborî de gelek li pêş bû. Ku dikarî di nava kilanan de sîstema berdêlê bikar bianiye a ku niha hemû bûye pere. Di heman demê de di aliyê biryarstandinê de berê her kesî li wê bû. Em dikarin bêjin ku dayîka xwedawend ji ber zanabûna wê heya astekê bibû serwer.

Rêber Apo jî wiha dibêje "Di cewherê xwe de xwedawendî, îfadeya jinê ye ku şoreşa neolîtîkê bi serfirazî pêk aniye".

### Çima jin gihandin vê rewşê?

Weke ku hatiye şîrokekirin. Derketina çanda xwedayetî jî, dijberî vê şoreşê pêş dikeve. Ji ber vê yekê derketina hiyerarşî weke dijşoreşî tê pênasekirin. Ew dem jî bi Sumeran re destpê dike. Em vê pêvajoyê jî zêdetir di mîtolojiyan de dibînin, tabletên wê demê jî hene. Me anîbû ziman ku pergala heyî jî rastiya jina xwedawend baş dizane, lê înkar dike ye. Ji ber dîroka ku niha hatiye nivîsandin, bi destê Sumer û rahiban hatiye nivîsandin. Dîroka mirovahiyê weke ku ji wan destpêkiriye nivîsandine. Lê bi milyara salên dûrûdirêj ê mirovahiyê beriya wê heye. Ji xwe zihniyeta wa di kerekterekî nûjen a sîstema heyî ya Modernîteya Kapîtalîzmê de tê sepandin.

Piştî derketina zihniyeta yekxweda a ku bi destê ew kalmêrên mezin dibûn di kilanê de ku êdî ne ndikarîn nêçîrê bikin û ne jî dikarin weke dayîka xwedawend bên esasgirtin êdî dest bi fêlbaziyê kirin. Ji wir fikarên li dijî xwedawendbûna jinê hate derketin. Her çiqas ev yek kêm be jî, yek ji sedemên derketina li dijî jin û berhemên wê ,ev e. Kalmêrên temen mezin êdî nikarîn hebûna jinê bi wî awayî qebûl bikin. Ji vir û pê ve şerê di navbera herdu zayendan de derket holê. Serdema Sumeran dest pê bû.

Ya girîng niha divê em bizanibin û bidin zanînê ku kombûna destpêkê, şaristaniya destpêkê, mirovahî û pêşketina wê beriya milyaran salan li derdora jina xwedawend hatiye avakirin û hunandin. Belê; belkî niha em bala xwe didinê ku tiştekî bi êşa dema em rewşa xwe, dayîkên xwe û tevahî jinan dibînin ku çawa di asta xwedawendiyê de bû, niha jî zayenda ku herî zêde li ser wê siyaset, leystûk, şerê taybet û bi hezaran pilan tên birêvebirin. Rastiya jin a wê serdemê weke ku Rêber Abdullah Ocalan ji tevahî mirovahiyê re eşkerekiriye, divê jina heyî li kur dibe bila bibe, kî dibe bila bibe; pêwîste heqîqeta xwe bizanibe.

Kurte rastiya pergal û zihniyeta serwer di van gotinan de îfade dibe "Tu kuletî bi qasî kuletiya jinê nehatiye qebûlkirin û rewakirin" Rêber Andullah Ocalan

Jin e. Jinê pêşengtiya destpêkê a ji jiyan û civakê re kiriye ye. Ji lewra divê em bizanibin gelo jinê çawa civakbûyînek bi heybet a ku dîrok nikare wê înkar bike li derdora xwe ava kir.

Rêber Apo gotiye "Zanabûna mirov a bingehîn di kûrahiyên neolîtîkê de veşartî ye, ji wê derê derketiye û bi pêş ketiye". Bi van gotinan û pê ve Rêbertî rola pêşeng û rewşa jin di civaka destpêkê de dinirxîne. Yekane tişta ku sumeran înkar kiriye û li hember wê bi înad sekiniye; Ew jî rola jina pêşeng a di civaka neolîtîkê de ango civaka xwezayî de ye. Li hember jina xwedawend hemû rê û rêbazên înkarkirin û tunekirinê bikar anîn heyanî ku gihand rewşa pergalê, civakê û ya mirovahiyê ku di kerakter û hişmendiya wê a heyî de em vê yekê bînin bîra mirovahiyê… ya din pergala heyî ji her kesî wêdetir rastiya ku li derdor jinê hatiye avakirin dizane.

Di vir de emê ji sîstema kilan de destpêbikin. Kilan yekîneyeke ku ji 30 heyanî 45 endamî/ê di nava xwe de dihewand û bi hev du re jiyan diafirandin. Di vir de rola sereke a jinê ye. jin weke hilberîna jiyanê tê dîtin. Di asta herî jor de ku weke pîroziyekê ye tê dîtin û hezkirin. Ji lewra jê re dibêjin xwedawend. Helbet ne tenê ji bo vê yekê dema em dibêjin jinê li derdora xwe jiyan avakir û hilbirand wê demê hemû tiştên bingehîn yên jiyanê bi destê wê hatine afirandin, yek ji wan jî çandiniye. Çandinî û keşifkirina xwezayê jêdera bingehîn a xwetêrkirin û zêdekirinê bû. Kedîkirina heywanan û xwedîkirina nebatan bi giranî bi firkir û hizrên



# 'Xebatên Zarhunera Havînê mîna dibistaneke hunerî ye'

Endamê Şanoya Çiya ku yek ji rêveberê projeya Zarhunera Havînê ye Simko Cûdî diyar kir ku xebatên projeya Zarhunera Havînê ji bo vejandina çand û parastina nasnameya her zarokekî/ê ye, hem jî qezenckirina demê bi awayekî rast ji bo zarokan e.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Di 1'ê Hizêranê de li ser asta Rojavayê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûrî ji aliyê Şanoya Çiya, TEV-ÇAND û Fontî Di Pace (Çavkaniya Aştiyê) projeya Zarhunera Havînê ya zarokan hat destpêkirin. Ev proje gaveke erênî ji bo pêşxistin û derbaskirina demeke bi sûd a havînê ji bo zarokan ne. Di vê projeyê de zarokên 7 salî heta 14 salî di aliyê şano, wêne û muzîkê bên perwerdekirin. Di heman demê de zarok bi rêya hunerê hebûna çand û nasnameya xwe biparêze, hem jî ji rewşên koçberî, şer û piskolojî dûr bikevin bi ruhekî zarokatî jiyan bikin.

Derbarê projeya Zarhunera Havînê ya zarokan, endamê Şanoya Çiya ku yek ji rêveberê projeyê ye Simko Cûdî ji Rojnameya me re axivî.

Simko Cûdî eşkere kir ku wan dirûşmeya projeyê "Em ê xwe fêrî xweşikbûn û zanistê bikin"ji nameya Rêber Apo ya ku ji zarokan re nivîsandibûn, gitiye û wiha domand: "Xebatê ku em didin meşandin xebatê Zarhunera Havînê ye, ev xebat jî li sernaserî Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku li Kantona Cizîr û Firatê tê meşandin. Ev xebat bi pêşengiya Şanoya Çiya, TEV-ÇAND û rêxistina Fontî Di Pace (Çavkaniya Aştiyê) tê birêvebirin. Herwiha du rêxistinên din jî wê ji bo Kantona Firatê alîkar bin. Xebatên Zarhunera Havînî mîna dibistaneke hunerî ye ku ji bo pêşxistin û xurtkirina zarokan di warê hunerî de. Sedema ku me dirûşmeya vê projeyê kir "Em ê xwe fêrî xweşikbûn û zanistê bikin" ew bû ku beriya demekê Rêber Apo ji bo zarokan nameyeke nivîsandibû û tê de ji zarokan re dibêje; xwe fêrî xweşikbûn û zanistê bikin, lewra me xwest li ser vê bingehê projeya xwe bidin meşandin."

### 'Projeya Zarhunera Havînê qezenckirina demê bi awayekî sûd ji bo zarokan'

Cûdî diyar kir ku yek ji armancên projeya Zarhunera Havînê ew e ku zarok di dema havînê de bikaribin rast dema xwe bikar bînin û wiha got: "Ev xebatê di 1'ê Pûşberê de hat destpêkirin û wê di 15'ê Tebaxa 2025'an de dawî dibe. Herwiha wê li bajarê Dêrikê, Tilkoçer, gundê Girbawî, Kampa Newroz ji bo zarokên Serêkaniyê, Qamişlo ji bo zarokên Efrînê, Rimêlan, Hesekê û Kobanê pêk were ku ew jî 8 navend ji bo vê xebatê tê armanckirin. Armanca sereke jî ew e ku di warê Şano de bikarin bi awayekî rast avakirina kesayetekî/ê li gorî civakeke demokratîk di nifşê nû yên zarokan de bidin çêkirin. Di warê wêne de jî xelayên zarokan berfireh bikin, aliyê din jî wê di hin bajaran de xebatên muzîkê were meşandin. Ev xebat jî, ji bo vejandina çand û parastina nasnameya her zarokekî/ê ye. Armanceke meyî din jî heye ku zarok di dema havînê de bikaribin rast dema xwe bikar bînin, ji bo wê jî gelek hewldanên me di rêya rêklaman de hat kirin, da ku malbatên zarokan bixin nava tevgerê de û xwedî li vê yekê derkevin û heya niha jî xwedîderketine baş heye. Herwiha me nêzî 1000 zarokî/ê di vê pirojeyê de hedef girt û di warê qeydkirina navan de em gihiştine nêzî armanca xwe, ez bawerim jî di rojên pêş de wê ew hejmar zêdetir bibe."

### 'Bixeyalên zarokan jiyanê ji asta xwebûnê heya hebûnê bidin nîşandan'

Simko diyar kir ku ji bo projeya zarokan Komîteyeke rêvebir ku ji 4 kesan pêk tê, hatiye avakirin û wiha pê de çû: " Berhemên ku wê di vê projeyê de derkevin herî kêm wê 10 lîstikên şano be. Deman demê de wê pêşengeheke mezin a wêneyan bi hejmara 1984 wêneyê di 15'ê Tebatê de bê lidarxistin, di wê pêşengehê de wek xeyalên zarokên Kurd taybet, hem jî çawa ku 15'ê Tebaxê çûleya yekemîn li dijî dagirkeriya li ser Kurdistanê bû û pêngava 15'ê Tebaxê, bi xeyal û wêneyên zarokan, jiyanê ji asta xwebûnê heya hebûnê bidin nîşandan. Ji bo vê xebatê jî Komîteyeke rêvebir ku ji 4 kesan pêk tê, hatiye avakirin û nêzî 15 mamosteyan li bajarên ku wê ev proje lê bê dîtin, ji bû beşên bên dayîn hatine erkdarkirin. Dîsa jî wê di dema projeyê de herî kêm wê li her bajarekî 2 çalakiyên hunerî were lidarxistin, da ku zarok bikaribin hunera xwe li bajarê xwe bidin danasîn, herwiha ev çalakiyên bên çêkirin jî dibe ku filim, şano yan konsertek be, ev jî wê ji aliyê komîteya rêveber a vê xebatê mehane werin lidarxistin. Amadekariyên vê projeyê bi awayekî xurt ji aliyên mamosteyên erkdar ve, hatiye kirin. Hem jî tevlîbûn heya niha bi heyecaneke pir mezin tê meşandin."



### 'Zarokan li ser hîmê parastina çand û nasnameyê mezin bikin'

Simko Cûdî di dewamkirina axaftina xwe de destnîşan kir ku peyama wan ji vê projeyê parastina çand û nasnameya zarokan ne û wiha got: "Peyama me jî ew e ku hemû malbatên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwedî li zarokên xwe derkevin ku zarokên xwe li ser parastin hîmê çand, nasname û hebûna xwe bidin avakirin û wan tevlî xebatên çand û hunerê bikin, da ku xwe di vê yekê de lipêş bixin. Heger ev proje bi awayekî serkeftî pêk hat, dibe ku di sala bê de di asta akadimikî ji bo zarokan di aliyê hunerî de, pêk bê."

### 'Zarok ruhê xwe yê zarokatiyê jiyan bikin'

Simko Cûdî axaftina xwe wiha qedand: "Di nava şoreşa Rojava di bi 100'an zarok ji aliyê dagirkeran ve şehîd ketin, mînaka wê jî şehîd Silava ku xebatkareke çandê bû. Rastiyeke ku di nava êrişên dagirkeriya de, xweparastin bi taybet di aliyê zarokan de cûdatiyeke wê heye, li aliyekî din jî zehemet e ku piskolojiya zarokan ne li gorî jiyana zarokbûnê be, ji bo wê jî xebatên ku em didin meşandin li ser bingehê ku zarok li gorî "Ruhê xwe yê zarokatiyê jiyan bikin, bi hîmê şoreşê hebûna xwe jiyan bike". Berî demekê jî dema êrişên dagirkeriya Tirk li ser herêma me pêk hat, zarok diçûn dibistan û navendên xwe yên çandê, ev jî vê yekê dide diyarkirin ku zarokên şoreşê bi hîmên şoreşê û hebûna Şerê Gelê Şoreşgerî ava bûne, em jî weke tevgera çandê vê bi xebatên istratîjîk nîşandin didin."





## Di dema qirkirinê de strîna strana azadiyê

**Remezan Olçen**

Li devr û berên Kurdistanê deng û newaya dengbêjan weke aveke zelal û rewan em li ser ekranên televîzyonan dibihîzin. Ev dengê efsûnî car bi car li dilê zar û zêçan dixe, lê pirî canan li dilê kal û pîran dide. Erê dengek e lê ev deng şahidiyê bi demekê re dike. Tê de arezûyên vegera li dewrên berê jî heye. Her çend ku di stranan de piranî evînên nîvçomayî, şerê êl û eşîran hebin jî. Ji ber wê ew deng şehadeta demekê, hêvî û daxwaza jiyanekê ye. Di serdema ku şoreşa dijîtal, globalîzasyon û siyaseta "yekkirina neteweyan" bi hostatî tê firotin, gelek netewe û civakên di bin nîrê bindestiyê de bi rêya têkoşîna xwe li dijî tinebûnê li dijî jêbirina nasname, dab û nêrît, folklor, çand û huner û zimanê xwe li ber xwe didin. Dîrok devedev tijî ye bi civakên di têkoşîna xwe de têkçûyî. Lê li aliyê din di dîrokê de civak jî hene ku tevî bi sedê salan di bin nîrê bindestiyê de jî karîbûne li ebr xwe bidin û bi awayekî ji awayan hebûna xwe bidomînin. Vaye civaka me bi vî rengî ye. Bi saya têkoşîna dehê salan Kurd îro dikarin behsa hebûna xwe, çand û ziman û dîroka xwe bikin. Ev ne hêsan bû û wisa tiştekî basît jî nîne. Pêşketineke mûazam e.

Dêhna xwe bidinê qet nebe ji dema illeta netewe-dewletê ket herêma me; li vê derê ji xeynî Kurdistanê dewlet û dewletokên çêkirî bi siyaseta qirkirinê xwestin gelê Kurd qir bikin, tine bikin. BI gelek rêbazan kirin. Bi eskerên xwe re ev kirin. Bi dibistanên xwe re kirin. BI mizgeftên xwe re kirin. DI vê serdema teknolojiyê de jî bi rêya ekranên televîzyonên xwe kirin û dikin.

Civak ji her aliyê ve dor lê hat girtin. Hebûn û rastiya Kurd hat berovajîkirin. Ziman û stranên wî hat qedexekirin. Dengbêjên wî bê deng hatin hiştin heta demekî. Lê ev heqîqet weke rojê timî xwe di derz û qelaştekan de nîşan da. Ronî kir, germ kir. Tine nebû. Dema em dibêjin tine nebû em nikarin îdia bikin ku bi tendurist jî dimeşe. Niv mirî maye. Rih li ber e lê din ava cih û nivînan de ye. Car bi car bi xebatine taybet weke ku were ser hişê xwe xuya bike jî jê re dem divê. Ji berk u pir hatiye êşandin. Tehde û êşkenceyeke mezin lê hatiye kirin. Ne tenê beden, hinav, dil û mêzî heta bi rihê xwe derb xwariye. Ku ev rastî nabe ku were înkarkirin. Ji ber çi? Ji berk u dema mirov înkar bike mirov nikare li rêyên tedawî û çareseriyê jî bigere.

Îcar dema me got çareserî û tedawî; mirov dikare li tecrûbeyên civakên wekî me binêre. Yên têk çûn sedema têkçûan wan çi bûn û yên bi ser ketin bi çi rengî bi ser ketin. Erê rast e ne têkçûn ne jî serkeftin ne ew tişt in ku mirov rabe ji cihekî îthal bike û bikre lê mirov dikare wê tecrûbê li parzûna rastiya Kurd bixe û bi vî awayî jê sentezek derxe. Li aliyê din ji tecrûbeyên civakan wêdetir di destê me de îlm û feraseta Apoyî heye ku bi rêya wê em dikarin xwe birêxistin bikin û bi vî awayî deriyekî felatê ji xwe re vekin. Bi vî awayî wê di vê serdema bûrehm de em dikarin wî dengê birîndar baş bikin.

Navê Kurdê azad li dinyayê bi têkoşînê belav bûye. Pir kes dizanin ku Kurd li dijî polîtîkayên pişaftinê li ber xwe didin, tûdikoşin. Lê di têkoşînê de em bi tenê nînin. Dêhna xwe bidinê ji Maoriyan heta Baskan, ji Katalanan heta bi Inuîtan ango li hemû parzemînan civak ji bo çand û huner, dîrok û zimanê xwe ji bo hebûn û azadiya xwe têdikoşin. Eve jî me di têkoşînê de digihîne hev ku em di demên qirkirinê de jî bikaribin strana xwe ya azadiyê bistirên.

# 'Xweparastin rêya jiyana bi ewle û azad e'

**Berdevka Meclisa Jin a PYD'ê Netewî Xemgîn diyar kir ku xweparastin hebûna mirovan nîşan dide û wiha got: "Ji bo berdewamiya jiyanê xweparastin girîng e, herwiha mirov bi riya fikir û rêxistinê dikare parastina xwe bike."**

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Xweparastin, li hember her hewldanek parçebûna hundirîn, mudaxeleyeke derve û êrîşekê, rêya tekane ya parastinê ye.Di vê demê de û li gorî pêvajoya heyî, xweparastin ji her tiştî bêtir girîng e. Di dema niha de xweparastin ji avê û xwarinê jî girîngtir e, bi taybet li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku êrişên domdar li ser tên meşandin. Mirov ne tenê bi çekan dikare parastina xwe bike lê belê mirov bi riya fikir, îdolojiya û rêxistina xwe dikare parastina xwe bike. Ji ber ku dewletên dagirker li kêleka şerê çekdarî şerê taybet jî dimeşînin.

Derbarê girîngiya xweparastinê li Bakur û rojhilatê Sûriyê, berdevka Meclisa Jin a PYD'ê Netewî Xemgîn ji rojnameya me re axivî.

**'Xweparastin hebûna mirovan diyar dike'**

Netewî Xemgîn destnîşan kir ku yek ji beşên sereke yên berdewamiya jiyanê xweparastin e û wiha got: "Xweparastin di xwazaya cîhanê de yek ji girîngtirîn beşê jiyanê ye, eger parastin tune be mirov nikare jiyana xwe berdewan bike. Parastin hebûna mirovan diyar dike, herwiha mirov bi fikir û rêxistina xwe dikare parastina xwe bike. Mirov ne tenê bi şer parastina xwe dike, lê bi zimanê xwe jî parastina xwe dike, dema ku mirov bi zimanê xwe biaxive û binivîse wê demê zimanê xwe didomîne û diparêz e. Li kêleka parastina ziman, parastin çandê jî heye, dema ku mirov parastina çanda xwe bike parastina cil û bergên xwe, stran, berhem, amûrên kevneşop û dîroka xwe jî dike. Ev tê wateya ku parastina hebûn û mafê xwe kirin.

Di nava civakekê de ku tundî li ser jinê tê kirin wê ew jin çawa parastina xwe bike, divê îdolojiya xwe di milê zanistê de xurt bike, hezkirina azadiyê li gel jinê zêde be, di milê leşkerî de xwe bi pêş bixe, îrade û berxwedaniya xwe ji tundiyê mezintir be. Xwenaskirin, dispilîn û rêxistin ji bo her jinekê û di heman demê de ji bo her endamek di nava civakê de lazim e. Divê her mirovek naskirina riya azadiyê û têkoşînê bike armanca xwe û wê pêk bîne."

**'Ji bo parastina mef û azadiyê xweparastin girîng e'**

Netewî Xemgîn diyar kir ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê xweparastin girînge û wiha domand: "Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê xweparastin di astekê de tê maşandin, lê divê hîn zêdetir bi pêş keve. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê xweparastin li hemberî DAIŞ, komên çeteyan, rêjîma Baas û dewleta Tirk a dagirker jî tê meşandin. Ev têkoşîna mezin a li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dibe ji ber ku bingehek wê ya rêxistinî heye, jin, ciwan, mêr û civakê bi gîştî xwe birêxistin kirine û di vê pêvajoyê de dimeşin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser pêvajoya îdolojî, projeya sîstema netewa demokratîk, sazî û sîstema jin di çarçoveya netewa demokratîk û hevjiyana azad de xwe bi pêşxistin e. Pêwîst e em hîn zêdetir hêza xwe xurtir bikin , xwe birêxistin bikin û di milê îdolojî û leşkerî de xwe bipêş bixin."

**'Bi şerê gelê şoreşgerî hebûna civakê didome'**

Berdevka Meclîsa Jin a PYD'ê Netewî Xemgîn axaftina xwe wiha qedand: "Şerê gelê şoreşgerî dema ku dagirker nasnameya gel a siyasî û mafî qirdike ev şer tê meşandin. Di bingehê şerê gelê şoreşgerî de xweparastin heye, di bingehê parastinê de jî ferd û civak heye. Li Bendava Tişrînê şerê



gelê şoreşgerî hat meşandin tevahî gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn mînaka vê şerî. Hemû gel bi erka xwe ya şoreşgerî rabûn û parastina bendava xwe kirin, li kêlekî ked û têkoşîna hêzên me yê leşkerî berxwedaniya gel a bê hempa hat meşandin. Erkê şoreşê anjî şerê gelê şoreşgerî li ser milê tevahî civak û gelan e, ji ber ku erkê gele ku şoreşê pêk bîne û destkeftiyên şoreşa xwe biparêzin. Dema ku di hundirî Sûriyê de mafê tevahî jin, gelê Kurd, Elewî û Dirûzî pêk nehat wê demê şerê gelê şoreşgerê wê bê meşandin û maf û helwestên xwe yê şoreşî, leşkerî, civakî wê xwedî lê derkevin û wê bistînin."

# Komîn mînaka civaka birêxistinkirî ye

**Amara Baran/ Qamişlo**

**Rêber Apo, "Ferd û welatiyên netewa demokratîk bi qasî ku komînal bin dikarin azad bin. Kesayeta azad a sexte ku ezezîtiya kapîtalîst li ser civakê kişkişandiye di rastiyê de koletiya herî kur jiyan dike. Netewa demokratîk li dijî ferdperestiyê ye û xwe di nava civaka azad a komînê de dibîne."**

**Nirxandinê Rêber Apo li ser komînê**

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di parêznameya xwe de ji bo komînê wiha dibêje: "Ferd û welatiyên netewa demokratîk bi qasî ku komînal bin dikarin azad bin. Kesayeta azad a sexte ku ezezîtiya kapîtalîst li ser civakê kişkişandiye di rastiyê de koletiya herî kur jiyan dike. Netewa demokratîk li dijî ferdperestiyê ye û xwe di nava civaka azad a komînê de dibîne. Di asta herî jor de cihê wê heye û bi giştî ji bo qadên jiyanê bingeh e. Mebesta me ji komînan ew e ku komên mirovên ku di her qadên civakê de çalak in. Ji lewre divê her gundek li gorî şert û mercên heyî komîn avabikin, heta derbasî tax û bajaran jî bibe. Her wiha komîn dikare xwe li kooperatîf, febrîqa, komele an jî di saziyên sivîl de jî ava bike. Di heman demê de di hemû qadên jiyanê mîna per-



werde, çand, huner û zanistê de dikare were afirandin. Ger wiha bibe mirov dikarê jê re bêje pergala komînal a demokratîk."

**Komîn civaka rêxistinkirî ye**

Dema şoreş pêk hat, gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hewl da komînan bi pêş bixînin, ji ber komîn mînaka civaka bi rêxistinkirî ye. Komîn li gund, tax, bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine avakirin û erka wan a esasî bi rêxistinkirina civakê ye, ji ber bingeha netewa demokratîk, azadî, wekhevî û edalete. Komîn di taxa xwe de kar, xebat, barê civakê, xizmetguzarî, mazot, xaz, paqijî, alîkariya mirovan di aliyê madî û manewî de pêk tîne. Gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi saya komînan parastina xwe ya rewa dike. Li ser axa Bakur û Rojhilatê Sûriyê gel bi saya komînan dikare xwe bi xwe bi rê ve bibe û civaka xwe bi rêxistin bike.

Derbarê girîngiya komînan hevserokê Meclîsa Bajarê Qamişlo Îzedîn Gedo ji rojnameya me re axivî.

**Komîn stûna civakê ye**

Îzedîn Gedo di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Komîn stûna civakê ye, bi rêya komînê pirsgirêkên civakê tên çareserkirin û xizmeta civakê bi awayek wekhev û kolektîf pêk tê . Komîn bi 3 komîteyên bingehîn hatin avakirin; Komîteya Xizmetguzarî( ku îro wek komîteya şaredariyê) tê naskirin, Komiteya Lihevanînê û Komîteya Parastinê. Komîn demokrasiya rastîn û yekser e, demokrasiya rasterast bi komînê dest pê dike û gel bi awayekî rihet mafê xwe yê heyî diparêze."

**Bi saya fikre Rêber Apo komîn xwe birêxistin dikin**

Îzedîn Gedo tekîldarê rola komînan wiha anî ziman: "Bi saya fikir û felsefeya Rêber Apo komîn hatin bi rêxistinkirin. Di gava destpêkê de komîn girêdayî mala gel bûn, piştî ku meclis û sazî hatin rêxistinkirin komîn bi meclisa bajar ve hatin girêdan. Li bajarê Qamişlo 110 komîn hatine birêxistinkirin, du bajarok jî girêdayê bajarê Qamişlo ne, li bajarokê Girbawî 60 komîn hatine rêxistinkirin, li bajarokê Tenûriyê jî 38 komîn hatine rêxistinkirin. Di hevpeymana civakî a nû de biryar hat girtin ku li 3 Taxên bajarê Qamişlo; Taxa Xerbî, Aşûriyê û Hililiyê meclis bên avakirin, da ku barê meclîsa bajar sivik bibe."

**Daxwaza gel ji bo komînan**

Îzedîn wiha domand: "Wek meclîsa bajarê Qamişlo li ser daxwaz û pêşniyarên gel taxên ku di bin rêveberiya Rejîma Baas de bûn komîn bên rêxistinkirin ji bo ku gelê ku li wan taxan dijîn bi awayek komînal û ji bo parastina taxa xwe, xwe bi xwe rêve bibe pêwîstî bi rêxistinkirina komînan heye. Herwiha ji bo projeyan jî Rêveberiya Xweser destekek baş dide komînan. "

**Komîn cîhê biryar û Îradeya gele**

îzeddîn da zanîn ku dema pisgirêkên gel di komînan de çareser nebe, dibin meclîsa gel û wiha domand: "Di komînan de kêmasî derdikevin piştê ku Rêveberiya Xweser hat damezirandin û sazî hatin avakirin, komîn lawaz man, ji ber ku piraniya civakê bere xwe da saziyan. Ji Rêveberiyê heta zarok û ciwanek ku li taxê, dijî cîhê xwe di komînê de digre, Rêber Apo girîngî dide komînê û wiha dibêje ger rojek ez ji Îmraliyê derkevim ez ê li gundê xwe komîn avabikim û xizmeta wî bikim". di roja me ya îro de komîn wek komiteya xizmetgûzarî tê naskirin. Wek meclîsa bajarê Qamişlo em hewil didin fereseta ku di nav civakê de pêş ketiye ji holê rakin, komîn cihê biryarê û îradeya gel e."

**Di komînan de cîhekê girîng yên komîteyan heye**

Îzedîn wiha i axaftina xwe zêde kir: "Komîteya Perwerdê tendûristî, parastinê û şaredariyê jî rolê xwe di komînê de dileyîze ji aliyê paqijî û xizmet guzariya taxê de gelek komînê bi awayek kolektîf derdorê kolana xwe paqij dikin û gel teşwîqê paqijiyê dikin. komîn hene her 15 rojan carek hemleya paqijiyê didin destpêkirin ji bo paqijiya kolanên xwe. komîteya parastina Cewherî ji bo taxa xwe ango komîna xwe biparêze din av liv û tevgerê da ye û xwedî roleke girînge. Komîta lijna silhê jî di komînê de rola dadgehê bileyîze. di hevpeymana civakî ya nû de de 15 komîte wê di cîhê xwe di komînan de bigrin."

Hevserokê Meclîsa Bajarê Qamişlo Îzedîn Gedo axaftina Xwe wiha qedand: "Hêviya me ew e ku gelê me komînên xwe esas bigre û ruhê komînalbûnê di jiyan û komînan de ava bike. Wek Meclisa Gel jî çi alîkarî lazim be em dikin. Komînên ku hatin avakirin bi saya fikir û felsefeya Rêber Apo bûn û gelek dahurandinên Rêber Apo li ser mijara komînê hene ku ew yek ji bo me esas e. Komîn cihê biryarê ye û esasê wê gel e, ji lewra em jî wek Meclisa Gel, gelê xwe esas digirin û armanca me ew e ku em vê projeyê bi ser bixînin."



# Ji dema Serxwebûnê ve sîstemên desthilatdariyê li Sûriyê... û sîstema herî guncaw ji bo Sûriya îro... (1)

Sûriyê di sala 1946'an de serxwebûna xwe bi dest xist. Sûriyê civakeke piralî bû ku ji parçebûnên neteweyî, olî, mezhebî, eşîretî û bajarî ve rastî astengîyan dihat. Herwiha di navbera niştecihên bajar û yên gundewaran de, koçber û niştecihên bajaran û di navbera bajarên mezin, bi taybetî Şam û Helebê de, rastî dubendîyan hat. Ev cihêrengî û piralî di navbera salên 1949 û 1970'î de bû sedema 20 derbeyan (inqilab) û hewldana lêdanan li ser bingehên mezhebî û herêmî.

**Piştî serdema serxwebûnê derketina kirîza nasnameya niştîmanî**

Di serdema piştî serxwebûnê de kirîza nasnameya niştimanî derket holê; ku aliyên li ser desthilatê nikarîbûn nasnameyeke niştimanî ya berfereh pêk bînin ku pêkhateyên cûda yên Sûriyê di nava wê nasnameyê de bibin yek. Mirov dikare bibêje ku qeyrana nasnameyê beriya serxwebûnê derketiye. Wek mînak, berî hatina Fransiyan di sala 1920'an de, xelkê Sûriyê padîşahek ji Hicazê daxwaz kirin, da ku wan birêve bibe û beşekî din ji xelkên Sûriyê jî şahê Erebistana Siûdî Ebdulezîz Al Siûd vexwendin ku bibe şahê Sûriyê.

Di serdema demokratîk a sînordar de ya ku di navbera 1954'an de û yekîtiya bi Misrê re di sala 1958'an de dirêj kir, berî wê di qonaxa derbeyê (Inqilab) de, aliyên lîberal ên bajarî rolek sereke di rêvebirina rewşa siyasî de li welat lîstin. Lê wê yekê di civaka Sûrî de cih negirtin û di bingeha çînî de ya ji çînên din ên li gundan, derdora bajaran û ji kêmîneyan cûda, sînordar ma. Jixwe ev çîn çavkaniya zengînkirina artêşê bûn ku bi vî rengî ev cûdakirin ji milê dîrokî ve nîşanek sereke di qada siyasî ya Sûriyê de ma, heya wê demê leşkerên ji gundewaran, wekî cîhadîst, qada siyasî ji nû ve desteser dikin. Di heman demê de aliyên bajarî yên Sûnî di vê rewşê de bêbandor in û daxwaza vegerandina ezmûna demokratîk ya salên 50 dikin.

**Paşguhkirina nasnameyên pêkhateyên civaka Sûriyê**

Yek ji sedemên sereke yên qeyranên wê serdemê û yên di pey wê re jî, ew bû ku îdyolojiyên serdest ên wê serdemê (wek neteweya erebî ya Sûrî, cîhana îslamî û navneteweyîya Komonîst) pêkhateyên civaka Sûriyê û nasnameyên wan ên berî niştimanîyê, paşguh kirin. Piştî ku ew îdyolojî yek bi yek li pey hev têk çûn; Ev nasnameyên etnîkî û mezhebî ji binê çînên van îdyolojiyan serî hildan û derketin pêş.

**Netew-dewleta navendî nikarîbû nakokiya enîya komunîst û dewletên Rojavayî bihewîne**

Netew-dewleta navendî li Sûriyê nikarîbû nakokiya di navbera enîya komunîst û dewletên Rojavayî (Ewropa) de, di nava xwe de bihewîne; lewra Amerîka erka şopandina bandora komunîst li Sûriyê sparte Ebid El-Nasir. Herwiha Dewleta neteweyî ya navendî jî nikarîbû nakokîya berjewendîyan ya di navbera paytexta aborî (Heleb) û paytexta siyasî û bazirganiyê (Şam) de himbêz bike; jixwe ev nakokî di hevrikîya navbera Partiya Gel (ku nûnertiya bijarde û bûrjûwaziya Heleb dike û pêwendî û yekîtiya bi Iraqê re weke berjewendiyeke herî bilind a stratejî dinirxîne. Û Partiya Niştîmanî jî têkiliya bi Misir û Siûdîyê re weke berjewendiyeke stratîjîk û bilind dinirxîne) diyar bû. Ev nakokî bû sedema hevrikîyeke herêmî ya tund di navbera Iraq, Misir û Siûdîyê de ku netewe-dewleta navendî nikarîbû wê hevrikîyê dorpêç bike. Paşê ev nakokî di sala 1958'an de bi yekîtiya bi Misirê re bi encam bû, êdî di sala 1961'an de jî ji Misrê cûda bû.

**Bi Partiya Baasê re sîstema sermayedariya dewleta burokratîk, ewlekarî û leşkerî hat avakirin**

Piştî ku Partiya Baasê di 8 Adara 1963'an de desthilatdarî bi dest xist, sîstema sermayedarîya dewleta burokratîk, ewlekarî û leşkerî hat avakirin; jixwe ew sîstem bi rêya hêza artêşê desthilatdarî dikir, efser û siyasetmedarên payebilind ên Baasî bûn burokrasiyeke xwedî serdestîyeke bê sînor ku navendên desthelatê li ser baaskên wê yên siyasî û leşkerî hatin belavkirin. Di encama nakokiya navbera baaskên leşkerî û siyasî de kirîzeke bêaramîya siyasî derket hole. Herwiha ew kirîz wergerî şêweyekî mezhebî û bû destpêka şerê mezhebî li Sûriyê. Di 23'ê Sibata 1966'an de baaskê leşkerî di vê hevrikîyê de bi ser ket û di encama nakokiya di navbera navendên desthelatê




yên baaskê leşkerî de, bêaramîya siyasî berdewam kir, di encamê de Hafiz El-Esed li hember Selah Cidîd bi ser ket û lêdana 1970 jî çêbû.

Piştî wê; Sûriyê seranserî 30 salî di aramîyeke siyasî re derbas bû, lê di rastiyê de ew aramî sarbûn û mirinek siyasî bû ku civak ji siyaset û her beşdarbûneke di karûbarên giştî de vala kir. Herwiha di wê demê de desteserkirineke giştî li ser rêxistinên gel û sendîkayên pîşeyî çêbû, jiyana partîtî ya ku heta salên 60'î jî gelekî çalak bû, bi rêbazên teşwîqkirin û tirsandinê, hate têkbirin. Di encamê de rewşa siyasî ya giştî di rûyekî protokolî ku Eniya Niştimanî ya Pêşverû ye (Elcebhe Elweteniye Elteqedumiye) û serokatiya Partiya Baas de hat sînordarkirin. Di encamê de, kurtasî û rastîya qeyrana navendî ew e ku rejîma giştgir (şimûlî) a Partiya Baas di navbera du rewşan de bû; yek ji wan bêaramiya siyasî beriya sala 1970'ê (Sûriyê di heft salên di navbera 1963 û 1970 de rastî çar lêdanyên xwînî yên cihê hat). Ya din jî mirina siyasî ya ku rejîma Hafiz Esed piştî sala 1970 ferz kiribû, nemaze piştî dawîanîna hevrikîya wî bi rêxistina Ixwan muslimîn re ya di 1982'an de, ew rewşa mirinê gihiştiye qadên çandî, sivîl, perwerdeyî û aborî jî.

**Di salên 1949 û 1954'an de Sûriyê ket qonaxa derbeyên leşkerî de**

Partiya Baas di 7 Nîsana 1947'an de ji aliyê Mîşêl Efleq û Selahedîn El-Bîtar, (ku damezrînerên Tevgera Baas a Erebî ne), û Zekî El-Ersûzî, (ku damezrînerê Partiya Baas a Erebî ye), piştî yekbûna her du partîyan, hate damezrandin. Eflek wekî damezrînerê îdeolojiya Baasê tê dîtin û nivîsên wî jî yek ji girîngtirîn jêderên di nav tevgera neteweyî de bûn; jixwe wî gelek ramanên xwe ji Îslamê û nirxên wê girtiye. Li gor wî; Baas tê wateya şiyarbûn an jî rabûnê, ango şiyarbûna Erebên ku ketibûn bin desthilatdariya Osmanî û Ewropayê de. Bîtar, Eflaq û El-Ersûzî li zanîngeha Sorbonê ya Fransayê fêr bûbûn û bi ramanên dewletanetew ya Ewropayê jî bi bandor bûbûn. Di navbera salên 1949 û 1954'an de Sûriyê ket qonaxa lêdanên leşkerî de. Di wê qonaxê de, di navbera artêşa Sûriyê û partiyên siyasî de, di nav wan de jî Partiya Baas, pêwendiyeke aloz dest pê kir. Di sala 1952'an de her yek ji Eflaq, El-Bîtar û Ekrem El-Hewranî li hev kirin ku Partiya Ekrem El-Hewranî (Partîya Sosyalîst a Erebî) bi Partiya Baas a Erebî re bikin yek û Partiya Baas a Erebî ya Sosyalîst ava bikin.

Bidestxistina kursiyê hilbijartinê ji aliyê Baasê ve

Ji sala 1952'an heta 1970'î de partî di qonaxên dîrokî re derbas bû ku bandorek mezin lê kir. Piştî hilweşandina hikûmeta Edîb Şîşaklî, Partiya Baas kursiyên hilbijartinê bi dest xist (15 kursiyên hilbijartinê). Pêşbirk di navbera wê û Partiya Komûnîst a Sûriyê, Partiya Gel, Partiya Sûrî ya Neteweyî ya Civakî û bi taybetî Partiya Gel a Komarî de bû. Partiya Baas jî mîna partiyên din ên Sûriyê di artêşa Sûriyê de alîgirên wê hebûn ku yê herî diyar efser Ednan Malikî bû ku kuştina wî di sala 1955'an de bû sedema dûrxistina Partiya Sûrî ya Niştimanî ya Civakî ji qada siyasî, ew jî piştî ku partî bi berpirsyariya kuştinê hat tawanbarkirin.

Piştî wê di navbera Şukrî El-Quwatlî û Cemal Ebdul Nasir de yekîtî bi Misrê re çêbû ku Ebdul Nasir ji bo pejirandina yekîtiyê, mercên xwe ferz kir, girîngtirîn merc jî hilweşandina partiyên siyasî li Sûriyê û qedexekirina beşdarbûna artêşê di siyasetê de bû. Ji ber ku Partiya Baas dirûşma "Yek Neteweya Ereb" bilind kir, mercên El-Nasir pejirand ji bo xewna yekîtiya Ereban pêk bîne. Di Sibata 1958'an de yekîtiya di navbera Sûriyê û Misirê de bi navê Komara Erebî ya Yekbûyî hate ragihandin, siyasetmedarên Baasî bi erkên girîng hatin destnîşankirin. Lêbelê, ew buhara di navbera Baasiyan û Cemal Ebdul Nasir de pir dirêj nekir. Ji ber ku komek ji efserên Sûrî yên ku li Misrê dijîn nerazîbûna xwe li hember hukûmeta yekîtiyê û kiryarên wê yên yekdestdariya biryarên girîng û dewleta polîsî xwe tê de berfireh dikir, nîşan dan. (Ev kom heman komîteya leşkerî bû ku di sala 1960'î de hat avakirin ku endamên wê Selah Cidîd û Hafiz El-Esed bûn). Jixwe xewna yekîtiyê di sala 1961'ê de bi derbeyeke din li Sûriyê bidawî hat ku ev partî ket nav krîzeke navxweyî di navbera kesên ku piştgirî didin cûdabûna ji Misrê û yên ku dijberiya wê yekê dikin.

Bi derbeya 1963'an re ku wek Şoreşa 8'ê Adarê tê binavkirin, heman komîteya leşkerî, desthelata sivîl û leşkerî li Sûriyê bi dest xist, ew jî mîna darbeya leşkerî ya li Iraqê ji aliyê Baas û neteweperestan ve li dijî hikûmeta Ebdulkerîm Omer bû.

**Navenda Rojava Ya Lêkolînên Stratejîk**

# Zekî Bedran: Nasnameya hebûna PKK'ê Rêber Apo ye


Siyasetmedarê Kurd Zekî Bedran anî li ser ziman ku PKK û Tevgera Azadiyê bi têkoşîna xwe ya 52 salan gelek deskeftî ji bo gelê Kurd dan qezenckirin û wiha got: "Rêber Apo bi avakirina PKK'ê gelê Kurd ji pencê qirkirinê xelas kir."

Argêş Vîyan/Qamişlo

Di derbare Kongra PKK ya 12'emîn û banga Rêber Apo ya "Aşitî û Civaka Demokratîk"
de, sîyasetmedar û civaknasê Kurd Zekî Bedran pirsên rojnameya me bersivandin û naveroka hevpeyvînê wiha ye:

**-Di destpêkê de çi pêwîstî hat dîtin ku PKK gavekê wiha dirokî bavêje; biryara xwe fesixkirinê bigire û dest bi pêvajoya guhertin û veguhertinê bike?**

Di 27'ê Sibata 2025'an de Rêber Apo bangeke dîrokî kir. Ev bang pir alî bû û aktorên wê yên sereke PKK û hikûmeta Tirk bû. Li ser bingeha banga dîrokî ya Rêber Apo di navbera 5 û 7'ê Gulanê de PKK kongra xwe lidar xist. Tê de gelek biryar hatin girtin, yek ji wan biryaran jî dawîanîn têkoşîna çekdarî bû. Perspektîf û gotinên Rêber Apo û di heman demê de jî, peyamên rêveber û fermandarên PKK ji bona mirov hez bike pêvajoyê fêm bike, têrker e. PKK'ê tevgereke ku 52 sal in têkoşîn dike û bi têkoşîna xwe her çar beşên Kurdistanê kir yek. Yê ku pêşengiya wê dikir jî Rêber Apo bû. Nasnameya hebûna PKK'ê Rêber Apo bû. PKK sînor hilweşandin û xwe ji partîbûnê jî derbas kir. Ev 52 sal in çi deskeftî hatine bidestxistin jî, bi saya Rêber Apo û PKK'ê bû. Ji ber wê yekê çarenûsa Rêbertî û rêxistinekê bi çarenûsa gelê wê re bû yek perçe. Ji ber ku hikûmeta Tirk ew yek baş dizanî bû, ji ber wê, Rêbertî kir armanca xwe ya sereke. Qirkirin, komkûjî û di heman demê de jî reşkirina di asta navnetewî de jî bingeh girt û xebatên xwe hemû li ser têkbirina PKK domand. Li ser wê bingehê jî ji reşkirina tevgerê û gelê Kurd de ezmûnek girt. Komara Tirkiyê bû rêxistinekê şer ya çekdarî. Bi taybet jî, di 10 salên dawiyê de, serokkomar hemû berpirsyartiyên dewletê di destê xwe de komkir û desthiladariyeke yek navend dan avakirin. Ji ber wê jî derfet û çekên destê xwe de hemû ji bona têkbirina pêşeng û fermandarên Tevgera Azadiyê bikar anîn. Bi hemû hebûna xwe re, bi hevkirina rexistinên çete yên weke El Qaîde û DAIŞ'ê dijminahiya xwe ya li hemberî Kurdan domand. Ji bona Rêber Apo, tevger û gelê Kurd re danûstandinan neke û ramanên Rêber Apo belavbûna wê ya cîhanî asteng bike, li ser Rêber Apo tecrîdekê domdar dan meşandin. Êrîşekê ku hemû Kurdan bike Tirk destpê kir û ev êrîş gehiştandin lûtkeyekê berfireh. Kurdan re politikaya qirkirinê ya 100 salan



rewa dîtin. Di wê demê de jî, faşizm, nijadperestî kirin yek û ji bona gelê Kurd qir bikin derfetên destê xwe de hemû da bikaranîn. Rêber Apo bi avakirina PKK'ê polîtîka qirkirin û tinekirinê ya li ser gelê Kurd tê meşandin, vala derxist. Cihê ku dewleta Tirk pengavekê erenî bavêje hertim qirkirina kurdan bingeh girt. Bi xistina PKK'ê ya listeya terorê ew dijminahiya hemberî civaka Kurd sor kir. Di sala 2020'an şûnda têkoşîna Tevgera Azadiyê gehişte lûtkeya herî bilind. Ji ber wê yeke dewleta Tirk bi riya ragihandina şerê taybet pêşniyara çekberdanê li PKK hat kirin. Lê Tevgerên azadiyê yên weke PKK çekberdan karê herî dawî ye. Lê di wan demanda PKK serkeftin û kêmasiyên xwe hemû danîn li hember hev û xwe pêvajoyekê nûda derbas kir. Dewleta Tirk li gorî serkeftina Tevgera Azadiyê û berxwedana gel, nêzîkbûne xwe guhert û erenî nezîkatî hat kirin. Li ser wê bingehê bi pêşengiya Rêberê Gelan Rêber Apo pêvajoyek hat destpêkirin. Dewletên hegemon û desthiladar fêmkirin ku bi gotinên ku "Em ê xelas bikin û biqedînin" zimanekê vala ye û zimanê dijminahiyê ye." Li ser wê bingehê li Rojhilata Navîn û Kurdistanê pêvajoyekê nû dest pê kir.

**-Pêvajoya bi navê "Aştî û Civaka Demokratîk" ya Rêberê Gelan Rêber Apo da destpêkirin, em weke civak û tevger çawa wê binirxînin?**

Rêber Apo li Kurdistanê pêşiya astengiyên alozî û qirkirinê hewildan kir ku vebike û derfetên destên xwe de, hemûyan bikartîn e. Dîsa jî erk û berpisyartiya herî mezin dikeve li ser milê gelê Kurd. Ji ber ku pêşengiya wê projeyê di deste gelê Kurd de ye û hêzên sereke yên ku wê pêvajoya dîrokî serbixin em in. Li holê li gel aliyê din yanî li gel dewleta Tirk bi fermî li rûyê erdê lihevkirin û hevpeymanekê berbiçav nîn e. Li gorî rewşa heyî Rêber Apo berpirsyartiyek mezin girt li ser milê xwe û li şûna têkoşîna çekdarî, hewildan dide ku jêrzemînê siyaseta demokratîk ava bike. Rêber Apo pêvajoyek ku di bingeha wê de goftûgo heye da destpêkirin. Ev dê çiqas bimeşe, çiqas bigihêje serkeftinê, pêşdîtîneke teqez nîne. Ji ber ku aşitî ti caran yekalî nayê bidestxistin. Rêber Apo û Tevgera Azadiyê gelek caran agirbestên yekalî ragihandin, di sala 2013 û 2014'an de pêşketinên dîrokî meşiyan. Ji ber ku xwasteka desthiladarî û hikûmeta Tirk ya aştiyê tine bû, di 2015'an de êrîşên topyekûn dan destpêkirin. Şer û pevçûnekê berdelên wê giran di 10 salan berdewam kir û armanca dewleta Tirk ew e ku çokdanîna erdê ya gelê kurd e. Modela qirkirinê ya binavê "Srî Lanka" dimeşînin. Xwediyê hişmendiyekê nijadperest û nedemokratîk hikûmeta AKP'ê ne aligirê çareseriyê ye. Wisa difikire ku Erdogan ger jêrzemîna aramî û mafdariya Kurdan pêk bê, ditirse hebûn û serweriya xwe li Tirkiyê winda bik e. Wisa xuya dike ku ger ew pêvajoye bikeve armanca berjewendiyên Erdogan yên sîyasî dê bidomîne, neke dê alozî û şer dîsa herêmê de gûrtir bib e. Li Tirkiyê de, hêzên veşartî yên ku aligirên şer jî hene. Pêwîste ku jin, ciwan û derdorên Tirkiyê yên demokratîk xwe rêxistin bikin û pêvajoyê re pêşengtî bikin. Ji ber ku ev pêvajo ne tene ya Kurdan e, ya demokratîk bûyina Tirkiyê ye, Rêber Apo xwe li hemberî mirovatiyê berpirsyar dibîne. Ec pêvajoye ji aliyê gerdûnî we jî pir bi hêz e. Rêbertî ji bona civaka demokratîk bang dike, ne ji bona dewlet yan ji hikûmete kê ji rêzê. Pêwîste em jî weke civak û gel em xwe rêxistin bikin û ji bona ev pêvajoya dîrokî serbikev e. Pêwiste bi zanebûna ku pêvajoyekî gerdûnî û dirokî ye nêz bibin, erk û berpirsyartiyên demê pêkbînin. Ev pêvajo pêvajoyekê gûhertina pergala Tirkiyê ya serdest, di heman demê de demokratîk kirina Tirkiyê ye. Ev projeya Rêber Apo pêşkeşê cîhanê dike tene ne li Tirkîyê ve sînordar e, di heman demê de guhertin û veguhertina cîhanê ye. 2016'an û şûn de, politikaya qirkirin û bişaftinê berdewam dike. Qeyuma li ser vîna gel, girtin û tecrîd bi heralî ve didom e û aboriya hikûmetê têkçûy e. Rêber Apo bi wê projeya û pêvajoyê re berpirsyartiya xwe ya li hemberî mirovatiyê pêkdîn e. Di aliyekê din de jî, heya dewleta Tirk pengavekê erenî neavêje, gotinên weke aşitî çêbû, em jiyanekê ji rêzê jiyan bikin gotinên xwe xapandinê ne. Rêber Apo bi wê bangê têkoşên xiste merheleyekê nû. Rêber Apo biryarekê jiyanî û dirokî girt û bangekê mezin Tevgera Azadiyê kir, erka mezin jî dikeve li ser milê dewleta Tirk êdî. Herî kêm bi şert û mercên wek hev de danûsitandin bên kirin û azadîya Rêber Apo bê mîsoger kirin. Li gor zagonên dewleta Tirk jî be, pêwiste Rêber Apo bê berdan lê, ji bona Rêber Apo gel û civakê qut bikin zagonên taybet û dijî mafê mirovan derdixin. Rûxmê ku DMME (Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewropa) biryar da cezayê li Rêber Apo hatiye bîrîn bê betal kirin, di heman demê de jî mafê hêviyê yê Rêber Apo bê dayin. Lê dewleta Tirk ev biryar jî nasnekir û vala derxist. Em jî dibêjin ku ji bona ev pêvajo bimeş e, pêwiste Rêber Apo pêşengî bike. Ji ber ku ji bilî Rêber Apo ti kes nikare gerîlayê azadiyê rêve bib e. Ger ku astengiyên pêşiya Rêber Apo bê rakirin ev pêvajo bimeş e û Gerillayê Kurdistanê tene wisa dikare bikeve jiyanekê asayî jiyan bik e. Aşitî yêkalî nayê.

**-Ji niha û şunda, piştî lidarxistina kongireya PKK'ê ya 12'emîn we pêvajo çawa bimeş e?**

Pêvajo û banga Rêber Apo de, xalan herî girîng "Bi dawî anîna têkoşîna çekdarî" û destpêkirina têkoşîneke nû ye. Pêwiste ev banga Rêber Apo kirî bê çalakkirin, lê ev ne tenê erka Tevgera Azadîyê ye. Li hemberî PKK'ê jî artêşekê NATO yê ya di asta cîhanê de rêza 3'emîn de hey e. Rêber Apo di bin tecrîdê da be û êrîşên qirkirinê li ser gel û civakê bê meşandin ev pêvajo dê têkbiç e. Pêwîste aliyên pêywendîdar li erka xwe ya bingehîn rabin. Ger Rêber Apo ji aliyê kurdan pêşenge pêvajoyê be pêwîste şert û merc wekhev bê kirin, ji ber herdû aliyên pêywendidar bikarin danûstandin bikin. Ji ber ku Rêber Apo vîna gelê Kurd e û biryardarê Kurdan yê sereke Rêber Apo ye. Pêwîste êrîşên li ser Tevgera Azadiyê û gerilayên Kurdistanê bê sekinandin û hevdîtinên ku tên meşandin bê fermîkirin. Dîlgirtiyên doza azadiya Kurdistanê hemû bên azadkirin. Rastî pênasekirina pêvajoyê, rêxistinkirina derdorên azadîxwaz girîng e. Tenê bi wan mercan meşandina pêvajoyê pêkan e.



## Xemsariyek diplomasiya me Kurdan!

Ahmet Aktaş

Di jiyana gelemperî ya gelan de dîplomasî, cihekî giring digre û mijarek ewqas hewcedarî pê heye ku divê neyê paşçavkirin.
Ji xwe gelên mîna gelê me ku di qonaxek wisa nazdar re derbas dibe de, ji gelên din ên asayî zêdetir pêdivî bi pênaseyê û piştgiriya cîhanî-navneteweyî heye.
Weke ku di nirxandin û banga Rêber Apo jî de tê dîtin, gelê Kurdistanê, ji qonaxa hişyarî, hişmendî, xwenasî, viyanî û xwebûnî derbasî qonaxa bidestxistina statuya azadbûnê dibe.
Di vê qonaxê/serdemê de, êdî li şûna xebata çekdarî û zordarî, şêwazê xebat û hewldana siyaseta demokratîk digre.
Mijara dîplomasiyê jî, di vê serdemê de hîn pirtir derdikeve pêş û rola wê zêdetir dibe, ji ber ku zemînê piştgrî û hevkariyê hêsantir û xurtir dibe.
Hilbet, heta niha gelek kar û xebatên kêrhatî ên dîplomatîk hatine kirin, divê ev xebat neyê jibîrkirin.
Lê di vî karî de bêgûman kêmasî û xemsarî jî hene, divê ev jî werin dîtin, da ku kar û xebatên me yên dema pêş hîn xurtir berhemdar bin.
Heta niha ji bo karê dîplomasiyê, bi bingehîn dewletên cîhanê yên mîna DYE, Rûsya, Ewropa û hwd...hatin e dîtin, ev ne şaş e, gotin jê re nîne, lê kêmayî hene, kî ne? Çîn û hwd.
Gelo çima têkilî heta niha bi Çînê re çênebû ye an heye lê kêm e û ez nizanim?
Li ser vê mijarê, kêm be jî, min bi hinek hevalên têkildar re guftugo kir, lê min bersîva têr û tije ne stand û kurt kurmancî di vê derbarê de xemsariyek berbiçav heye.
Doh, di çapemeniyê de hevpeyvînek li gel profesorekî Çînî, bi navê Prof.Dr.Ruiheng Li, hebû.
Vî kesî, teza xwe ya doktoriyê li ser Gelê Kurd çêkiriye û weke çav li xezineyekê bikeve, di roportajê de gelek pesindariya Kurdan dike û di encama lêgerinên xwe de pirtukekê jî li ser Kurdan dinivîsîne.
Ji dîrokê ve despê dike tê heta roja îro; ji bandor û hêjatiya Seleheddînê Eyûbî tê heta qehremaniya li dijî DAIŞê.
Ev profesor, li paytextê Çînê di Zanîngeha Bekînê de mamoste ye û lêkolîn û lêgerînên xwe yên li ser Kurd û Kurdistanê, hîn jî bê rawestan dide meşandin û ji bo avakirina Kurdilojiyekê jî di nava hewldanan de ye.
Carekê hatiye Başûr, bi gelek kesan re hevdîtin çêkiriye û dibêje "ez bi Başûr tenê ranawestim, ez ê derbasî her çar perçeyên din jî bibim" û hwd.
Li vira balkêşiyek hevpar heye, çawa em rexneya li xwe dikin ku "ji bo çi heta niha me xemsarî kiriye li ser têkiliyên bi ÇÎnê re", ew jî heman rexneya li Çînê dike ku "çima heta niha têkilî bi Kurdistanê re xurt nekiri ye"?
Ew, sedemên vê rexneyê jî destnîşan dike; "him dîrokî û him niha jî Gelê Kurd, bi rûmetên xwe, ne tinê li ser her çar dewletên dagirker bi bandor e, belê li hemû herêma Rojhilata Navîn xwedî bandor e û niha li cîhanê jî bi erênî nav vedaye"!
Di encamê de, li goreyî konjoktora giştî jî, pêdivî bi xurtkirina têkiliyên welatên mîna Çînê re hene.



# Tevlîbûna çekdarên biyanî di nava artêşa Sûriyê de

Di meha derbasbûyî de Nûnerê serokê Emerîkayê Thomas Barrack ragihand ku ew tevlîbûna bi hezarên çekdarên biyanî yên tundiraw di nava artêşa Sûriyê ya nû de erê dikin. Ev gav jî li cem gelên Sûriyê bû cihê metirsiyê.

Lîloz Hisên/Qamişlo

Li gorî raporeke ji Ajansa Reuters parve kiribû berî demekê, tê de erêkirina Emerîkayê ji bo tevlîbûna çekdarên biyanî di nava artêşa Sûriyê de erê kir, vê yekê gelek fikar di nava welatiyên Sûriyê de çêkir. Pilan li gorî berpirsyarên ji wezareta parastinê wê 3500 çekdar praniya wan Uygur, Çîn û dewletên cîranin tevlî firqeya 84'an bibin.
Hejmara çekdarên biyanî ku bi HTŞ'ê re şer dikirin bi hezaran e. Li gel Partiya Îslamê ya Tirkistanî, wekî din hin beş weke Şîşanî, Qoqazî, Ozbek, Tacîk û Tirkman li gel Ereb û hwd..

### Çekdarên biyanî kîne?

Ji destpêka şerê navxweyî li Sûriyê ku 13 salan dewam kir, bi hezaran biyaniyên Sunî tevlî komên opozîsyona Sûriyê bûn, beşek ji çekdaran komên taybet yên girêdayî xwe çêkirin, wekî din hin kom tevlî rêxistinên terorist weke DAIŞ û Qaîde bûn, herwiha hin ji wan tevlî komên weke HTŞ' bûn. Ev çekdarên biyanî ji dewletên cuda ne di nav de Uygur in. Uygur, komeke etnîkî ne ku li herêma Sinjiang a bakur-rojavayê Çînê dijîn, bi zimanê tirkî diaxivin û xwe wekî welatiyên dewleta Tirkistana Rojhilat dihesibînin, parêzgeha Sinjiang a Çînê ye. Li Sûriyeyê partiyek bi navê "Partiya Îslamî ya Tirkistan" li dar xistine.
Li gorî rapora ajansa FRANCE 24, fesîleyên din hene mezin an biçûk in di bin sîwana Tirkiyê de ne, piraniya wan bi HTŞ'ê re an girêdayî wê bûn, hejmara wan di navbera 3500 û 5000 çekdar in. Berovajî DAIŞ û Qaîde dijberî HTŞ'ê bûn ku di navbera wan de gelek şer û pevçûn derket di dema borî de, li gorî pisporê ewlehiya istratejîk û lêkolînerê siyasî yê Urdinî Omer El-Redad. Oygur stûna çekdarên biyanî di bin ala Heyet Tehrîr El-Şam de ne, ew ji Çîn û nava Asyayî ne herwiha girêdayî Partiya Îslama Tirkistanî ne ku li Pekînê li ser lîsteya terorê ne.

### Emerîka rê da ku çekdarên cîhadî tevlî artêşa Sûriyê bibin

Reuters 2'ê Pûşbera 2025'an ragihand ku nûnerê taybet ê Emerîkayê yê li Sûriyê Thomas Barrack, eşkere kir ku Washingtonê planeke nû ya Sûriyê ji bo tevlîbûna çekdarên tundrew di nav refên artêşa Sûriyê de erê kir. Li gorî ajansê, rayedarên leşkerî yên Sûriyê piştrast kirin ku plan ew e, ku nêzî 3,500 çekdarên biyanî,



ku piraniya wan Uygurên Misilman ên ji Çînê ne, di yekîneyeke leşkerî ya nû avabûyî, Firqeya 84'an a artêşa Sûriyê de, ku dê Sûrî jî di nav de bin. Ajansê destnîşan kir ku El- Şeri hewil da ku dewletên rojavayî îqna bike ku tevlîkirina çekdarên biyanî ji terikandina wan kêmtir xeternak e.
Dema ku Reutersê li Şamê ji Thomas Barrack, balyozê Amerîkayê li Tirkiyeyê, ku meha borî wekî nûnerê taybet ê Trump ji bo Sûriyeyê hatibû tayînkirin pirsî gelo Washington razî bûye ku çekdarên biyanî tevlî artêşa nû ya Sûriyeyê bike got, "Ez dixwazim bêjim ku têghiştin û şefafiyeteke heye". Wiha lê zêde kir "Mayîna çekdaran çêtire di projeya dewletê ji bilî dûrxistina wan herwiha gelek ji van çekdaran alîgirên desthilata Şamê ya nû ne." Li ser piştgiriya Emerîkayê ji bo QSD'ê wiha got: "QSD'ê hevalbendê me ne, piştgiriya me ji bo wan weke piştgiriya hevalbend e, ji bo Kongreya Emerkîayê pir giring e."

### Bertekên li dijî vê biryarê

Piştî raghandina vê biryarê di nava gelê Sûriyê de gelek bertek li dijî vê yekê derketin, nemaze ku destê gelek van biyaniyan di komkujiyên ku li berava Sûriyê de çêbûn hene û heta niha bêyî mihasebe hatine hiştin. Tevlîbûna çekdarên biyanî êdî bi xwe re wê bandorke mezin li ser gelê Sûriyê û xeteriyekê li ser ewlehiya wê bike. Ji ber ku ev kesên tundrew in û baweriya welatiyên Sûriyeyî bi van çekdarên cîhadî tune ye herwiha di nava lîsteyên terorê de ne, êdî wê bi jiyaneke fikar bijîn. Desthilata Şamê diyar kiribû ku ew ê nasnameya Sûrî bide van çekdaran, lê mixabin gelek welatiyên Sûriyeyî ku bi hezarên salan li ser vê xakê jiyan dikin heya niha nasnameya wan tune ye.
Parêzer Zeîd el-Edim derbarê vê yekê û piştî ku destûr hat dayîn ku 3,500 çekdarênên tundraw ên Tirkistanî tevlî Firqeya 84'an li beravê bûne got, "Ji niha û pê ve, xatir ji berava Sûriyeyê û bi xêr hatin berava Uygur re." Wî destnîşan kir ku berava Sûriyeyê hêdî hêdî vediguhere navendeke cihê terorîstan.

### Berteka dewleta Çînî

Di bersiva van pêşketinan de, berdevkê Wezareta Derve ya Çînê got, "Em hêvî dikin ku Sûriyê dê li dijî hemû cureyên terorîzmê û hêzên tundrew derkeve, li gorî fikarên civaka navneteweyî." Di heman demê de, berpirsê siyasî yê Partiya Îslamî ya Turkistanê, Osman Bogra, di daxuyaniyek nivîskî de ji Reuters re ragihand ku "Ev kom bi fermî hatiye hilweşandin û tevlî artêşa Sûriyeyê bûye. Niha, ev kom bi tevahî di bin desthilata Wezareta Parastinê de dixebite, pabendî siyaseta neteweyî ye û tu têkiliyan bi partî an komên derveyî re nagire".

# Pakêta xapandinê

Mehmet Alî Ertaş

Hikûmeta AKP'ê li şûna ku ji kok ve Destûra Bihgehîn li gorî mafên mirovan ên gerdûnî û pêdiviyên demokrasî, edalet, heq û hiqûqê biguherîne, her salê carekê pakêteke girtî ku di nava wê de çi heye ne diyar e pêşkêşî meclisê dike. Bi van pakêtan desthilatî û serweriya xwe ya ser gelê Tirkiyeyê mîsoger dike. Her ku pakêteke darazê tîne rojevê, wekî mizgîniyê bide gelê Tirkiyeyê tev digere û li gorî xwe zagonan diguherîne. Her pakêtek di meclisê re derbas kiriye, hikûmdariya xwe ya li ser gel û partiyên din bêtir xurt kiriye. Bi van pakêtan xwe mîsogre dike. Niha jî 10'emîn pakêta darazê xistiye rojevê. Her çend saziyên mafên mirovan, rêxistinên civakî, nivîskar, rewşenbîr, hiqûqnas û civaknas li dijî vê pakêtê nerazibûnên xwe bînin ziman jî hikûmeta AKP'ê van bertek û nerazibûnan tevan paşguh dike û di dawiya dawî de li gorî daxwaza xwe pakêtê di meclisê re derbas dike.
AKP'ê heta niha pakêtên dahfik û xefikan ku anîne meclisê, wekî pakêtên edalet û demokrasiyê nîşan daye. Lê piştî pakêt bi raya giştî re hatiye parvekirin, aşkere bûye ku hundirê pakêtan vala ye û li şûna edalet, demokrasî û mafên mirovan, bêtir zagonên ku rê li pêşiya mafê azadiyê digirin derketiye pêş.
Di sala 2019'an de ku şewba Coronayê dest pê kir, hikûmeta AKP'ê 3'yemîn Stratejiya Reforma Darazê anî rojeva Tirkiyeyê. Ji wê demê heta niha 10 pakêtên darazê aniye rojeva meclisê û yek bi yek di meclise re derbas kiriye. Her çend partiyên muxalif li dijî van pakêtan derketiye jî, daxwaz û pêşniyarên partiyên muxalif li ber çavan negirtiye û pakêt li gorî daxwaza xwe di meclisê re derbas kiriye. Hikûmeta AKP'ê bi dirûşmeya "Sedsala Tirkiyeyê sedsala edaletê ye" wekî pergala edaletê ya ku serweriya edalet û hiqûqê esas digire derdiye pêş. AKPê di sala 2021'an de bi dirûşmeya"Bi mirovê azad û bi civaka bi hêz; Tirkiyeyeke bêtir demokratîk" dîsa xwest civakê bixapîne. Lê piştî van pakêtan me dît ku bêtir girtin, binçavkirin û kuştin zêde bû. Xizanî, binpêkirina mafan û îşkenceya li ser girtiyan û kolanan zêdetir bû. Li şûna bi van pakêtan dawî li neheqî, bêhiqûqî û binpêkirina mafan bîne, raporên mafên mirovan nîşanî me dide ku tundî, binpêkirina mafan zêdetir bûye. Niha li Tirkiyeyê zêdetirî 410 hezar girtî hene. 110 hezar girtî, zêdetirî kapasîteya girtîgehan girtîne. 10 qat zêdetirî Almanyayê mirov girtî ne.
Daneyên li girtîgehan, kuştina jin û karkeran, dizî, işkence û talankirina xwezayê nîşanî me dide ku hesap ji kesên ku sûcên edlî dikin nayê pirsîn. Lê bi deh hezaran mirov ji ber nivîs, gotin, huner û siyaseta xwe hatine girtin û girtî têne darizandin.
AKP dîsa bi pakêta 10'emîn dixwaze qeyrana edalet û demokrasiyê kûrtir bike.
Ji ber ku girtiyên nexweş ên ciwan nikarin sûdê jê bigirin. Ji ber ku girtiyên cezayê muebeta giran girtine nikarin jê sûdê bigirin. Di serî de Rêber Abdullah Ocalan 4 hezar girtiyên siyasî ku cezayê muebatê xwarine nikarin ji mafê hêviyê sûdê bigirin.
Ji ber ku heta ATK rapora 'Nikar di girtîgehê de bimîne' nede girtiyan, ew girtî dê neyên berdan.
Ji ber ku tenê girtiyên du canî, girtiyên li gel zarokên xwe girtî, girtiyên edlî dê karibin sûdê bigirin.
Ji xwe heta niha gelek caran pakêtên darazê hatine rojeva meclisê, lê tenê girtiyên ku dizî kirine, girtiyên ku sûcê tiryakê, fihûşê kirine, Girtiyên ku cînayet kirine hatine berdan. Lê girtiyên siyasî yên ji ber fikr û gotinên xwe hatine girtin, ew heta niha bi van pakêtan nehatine berdan û xuya dike ku dê bi pakêta 10'emîn jî neyên berdan.
Li komisyona dadê ev pakêt hat niqaşkirin. DEM Partî, CHP, MHP, Deva Partî, Îyi Partî, HDK li dijî pakêtê derketin. Lê dîsa AKP daxwaza partiyan red kir û pakêt bi dengê AKP-MHPê di komîsyonê re derbas kirin.
Dijderketina van partiyan bi xwe nîşan dide ku ev pakêt tenê li gorî daxwaz û berjewendiyên AKPê hatine amadekirin. Vîna partiyên siyasî, civak û rêxistinên demokratîk û vîna gel esas nehatiye girtin. Dîsa Biryara DMMEyê û pîvanên mafên mirovan ên gerdûnî li ber çavan nehatiye girtin. Ji ber daxwazên gel û partiyên muxalif esas nehatiye girtin, heviyê nade û bertekên li dijî vê pakêtê zêde ne.
Parlamentera DEM Partiyê Dilan Kunt Ayan, girtina Şaredarê Stenbolê wekî darbeyê pênase kir û da zanîn ku pakêta darazê li dijî edalet û mafên mirovan e. Dîlan kurd destnîşan dike ku girtiyên ku cezayê muebeta giran girtine nikarin ji vê pakêtê sûdê bigirin
Parlamenterê CHPê Suleyman Bulbul jî balê dikişîne ser gotina Serokê MHPê Devlet Bahçelî yê mafê heviyê û bibîr dixe ku mafê hêviyê di vê pakêtê de tune ye. Bulbul, destnîşan dike ku di vê pakêtê de wekhevî, û edalet tune û li dijî Destûra Bingehîn e.
Parlamenterê Partiya DEVAyê Îdrîs Şahin jî vê pakêtê li dijî hiqûqê dibîne û destnîşan dike ku ev pakêt daxwazên civakê nabersivîne.
Parlamenterê Partiya ÎYÎ Hakan Şerif Olgun jî li dijî pakêtê derdikeve û dixwaze ji nûve xalên pakêtê sererast bikin.
Lê di encamê de b dengê AKP û MHPê pakêta darazê di komîsyona dadê re derbas kirin û xwe esas girtin.